Çawaniya reftarkirinê di navbera jin û zilaman de.

Lîda Şêrvanî

Di nav her malekê de ew tiştê ku dibe sedema zêdebûna viyan, reftar û kirdarên afiret û zelamî beramber êk û dûye. Di vê navberê de rola afiret zortir karîgeriya xwe heye... Eve çend rêk bo afiretan ku bişên zortir zelamê xwe ber bi xwe rakêşên:

1- Ji her kesekê cuda bin

Her çend e ku rakêşan giring e, bes eve bi tenê karîgeriya xwe nake. Wata rakêşan û viyan li gel her zelamekê cudaye. Pirsiyar eve ye ku çawa dişên cuda ji kesên dî bîn? Bo mînak: Heger hun zaravekê taybet dizanin diyar bikin, yan jî heger we tiştekê seyir heye nîşanê kesên dî bidin ji ber ku dibe egera cudabuna we ji yên dî. Heger hun wek afiretên dî bin zû dihêne ji bîrikirin.

2- Suprayzekê bikin

Pêşiniyara min eve ye ku karekê li derveyî hizra zelamê xwe encam bidin ku ev kare dibe bîrihatinek li gel wî

3- Taybetmendiya xwe ya cuda ji yên dî aşikira bikin

Heger bi zimanekê dî daxivin, heger we berê di dewletekê biyanî de jiyane, yan di havînekê de seredanek bo deştekê kirî ye, pêdivî ye di derbarey wan de giftgo bihê kirin. Heger vê karê encam bidin, zelamê we, hun wek kesekê seyir û cuda ji yên dî dizane.

4- Guhdar bin, guhdar bin û dubare guhdar bin

Zortir ji zelaman di wê baweriyê de ne ku afiret zor giftgo dikin. Baweriyekê li gel xwe çêbikin ku hun zortir guhdaryê dikin. Lê hindek zelam kêm daxivin û li ser we pêdivî ye ku hun giftgoyê bikin, her wesa zelamê xwe neçar bikin ku bipeyve. Hun dişên bi babetekê li gel dilê xwe dest bi axiftinê bikin û pirsiyarên kurt ji zelamê xwe bipirsin. Ev kare bi piştirastî wek hunerekî dihê zanîn. Piştrast bin ew demê ku ne li gel weye, li gel xwe dibêjît; "bi rastî, ew hez ji min dike?"

5- Kesekê dilveker bin

Hîç kesek nîne ku li gel kesekê dilveker nebe. Di danûstandinên xwe de, xwe ji axiftinên nêgatîv û zêdegavî dûr bixin. Rêzigirtinê li bîr û buçunê her kesekê bigirin, ne pêdivî ye ku Gorankarî di bîrûbuçunên her kesekê de bikin û wî kesî şermezar bikin. Çi kesek bi temamî her karekê nizane û em hemû şaş dibîn û ji bîr nekin ku çi tişt ji şermezarî nexweştir nîne.

6- Xwe ciwan bikin

Zelam wek kesekê hestiyar nîne û zortir bawerî bi nêrîna xwe heye, lewma pêdivî ye xwe bo zelamê xwe ciwan bikin. Bu dilxweşkirina zelama pêdivî ye ew tiştê ku li gel wan dihê berçavkirin encam bidin.